Hişyariya jineka mirî

Evîn Îbrahîm

Wergerandin ji Erebî: Cankurd

Sî sal derbas bûn

hîn hêsir

zindankiriya odeyên xewnên min e

Min bi wê maweyên liyaniyê(1) derbaskirin

Ramanan tevadike… û geme ya (2) jînê…

Sî sal çûn… û ez çavrêya nehanê dikim..

Ez bi serava (3) rastîn bawerim

û bi pey rewanê mirî dikevim

Sî sal derbas bûn

û ez jineka kurdî me… tenha ji pênc tîpan?!

Sî sala derbas bûn

Berî ku peyvên wî ji ronahiyê avmêtî bibin

kûraniyên min ên hindik

ku ez hêsireke wîjdanê dişû

azad bikim

gunahê min, wekî dildarekê, bibexşîne,

Ewa dilekî diçîne

ku ji nîştiman pê ve tiştek tê hilnayê

Gava min dîtî… ba ji razên (4) wê re velikumî…

Parçeyên êlê civandin… û nîştê regezan (5)

Hîngê min nas kir…

çewa serbilindiya birçiyan

têye reşekuştin (6)

Hêsirên dayîkan têne girtin…

Berî mirinan gor têne kolan…

Li wir, li nişte min…

Zarok ê ji dayîk dibe pîr e

û xewn ne sax e

û dîtirê roja me … bû rêwiyekî rêyeke bê rêç

Li wir, li nişte min

Jibîrbûn di koşeyên rojan de dipine

Bibîranîn xwe di ewirekî stewr (7) de vedişêre

Yê Kurd ji şîrîniya xewnê dest pêdike

Ku li tehliyên nên bi dawî bîne

Li wir, li nişte min…

Rêsa (8) diteqe

Bi binvekirineke hosan

Di govdeyê jinekê de… Ji ezel ve mirîye

Li wir, li nişitê min…

Şahiya cejnê… dinale

Ewir peya dibe

Mij parsê dike

û azadî têye bipaşvedan… bipaşvedan

Berkenîn gavên xwe ji bîr dikin

Ji dayîka gorî şahiya wê têye standin

Li wir, li nişitê min

Tiştek narazeyiya xwe nake… ji xweriskê (9) pêve

Gava…

Geya rengê xwe yê kesk bi cî dihêle

Gulegenim (10) teneyên xwe ji ber davêje

Ewir hêsirê xwe dadiqurtîne

Bihna gulan koç dike

Li wir, li nişтê min…

Enfal hatin afirandin

Cîhan li hember qirkirinan...riswa dibe

Li wir, li nişтê min

Afret vedimire… di şikeftin jibîrkirî de

Kelehin diherifin… ku ji azadiyê re hatîne avakirin

Li wir, li nişтê min

Cîh û mirov têne Erebkirin

Erê, ba jî Ereb kirine???!

Lawik bi dizîka dibêje… Bavê min Kurd bû

Dilê xwe ji bîr dike

Gava mabûn kirasê wî

yê bi pêjiniyên hejarî û pêdiviyê xemilandî

vedireşîne…

Li wir, li nişтê min

Ji dengvedanê pêve

Tiştek naye bihîstin

Nalîna siyekê,

ku di paş çiyan de berşê bû

Yê Kurd bîra mirovatiya xwe dike

Her roj hezar caran dimire

Xwe bi revînê dipeçine

Keyîka serfiraziyên kevnedemî dike

Seriyê xwe datîne ser rojavayekî zal (11)

Li ser bînbalkekî jihevketî

Çaverêya westanê dike

Tenê niha…

Ez jineka kurdî me

Ji pênc hezar hêsir

Hîn bihna Helebçe dikişîne

Bi janên jêmayî yên Enfalkiriyan dilê wê lêdide

---

(1) Liyanî: عشق

(2) Geme: عبـث

(3) Serav: سـراب

(4) Raz: سـر

(5) Regez: سلالة

(6) Reşekujî: اغتيـــال

(7) Stewr: عـاقر

(8) Rêsa: النـــاموس

(9) Xwerisk: الفطـــرة

(10)Gulegenim (seryan): سنبلة

(11) Zal: عظيـم ، هائـل ، كبـــير